



CIWANÊN ŞOREŞGER

KOVARA TEVGERA CIWANÊN ŞOREŞGER Ê SÛRIYÊ

2023 İLON/COTMEH

HEJMAR 21



“

BI VÎN Ü ÎRADEYA CIWANÊN APOYÎ EMÊ KOMPLOYÊ TÊK BIBIN

”



CENGA AZADIYÊ SERBIXIN

NAVEROK

المحتويات

5 KOMPLOYÊ NAVDEWLETÎ Û RASTÎYA PERGALÊ
RÊBER APO

10 PERSPEKTÎFA CIWANÊN ŞOREŞGER
BAWER AGIR

14 JI BO BÎRANÎNA ŞEHÎD VEJÎN JIYAN
NÛJÎYAN OCALAN

18 ŞOREŞGERÊ APOYÎ YÊ PÊŞENG Û MUKEMEL
HARÛN BARAN

22 JI PÊXEMBERAN HEYANÎ RÊBER APO
Û RÊWÎTİYA 9'Ê COTMEHÊ
DELÎL DOXAN

الشبيبة التي تقود الواجب الإنساني التاريخي من التحرر
القائد عبدالله أوجلان

٣

توجيهات المرأة الشابة
نوجان ساردوز

٨

تعريف بمجلس شباب سوريا الديمقراطية
ناصر ناصiro

١١

الدفاع المشروع عملية الدفاع المشروع إلى ضرورة من
أجل الاستمرار في الوجود...
مسعود ابراهيم

١٤



Ragihandina Ciwan

Li hember şerê taybet,
weke ragihandina şerê
gelê şoreşgerî, xebatkarên
«Ragihandina Ciwan» bi
awayekî dîlxwaz û bê navber
di têkoşînê de ne.

Bi nêrîn û pêşniyarên xwe
Bi şandina berhemên xwe
Bi buyina endamê
«Ragihandina Ciwan» bibe
dengê heqîqetê...

إعلام الشبيبة

في مواجهة مع الحرب الخاصة
كأعلام للحرب الشعب الثوري
نشطاء الأعلاميين
للأعلام الشبيبة
يعملون بلا كلل وملل
ولابيعرفون التعب
دائماً موجودون بين النضال

من خلال تقديم آرائك
واقتراناتك عن طريق تقديم
منتجاتك، عن طريق أن تكون
عضو من هذا العمل
أنت أيضاً
ستصبح صوت الحقيقة

ciwanensoresger.com

[ragihandinaciwana](#)



[t.me/Rac_ciwan](#)



racciwan@gmail.com



[ragihandinac](#)



[RacPress1](#)



[fb.com/Racpress](#)



RÊHEVALÊN HÊJA...

Bi rihê berxwedana Zap, Avaşîn û Metînayê, bi hêrsa tolhildana ji şehîdên şoreşê, zehmetiyênu ku Rêber Apo di şert û mercên tecrîde û işkenceya derûnî di zindana Îmralî de jiyan dike û ji zehmetiyênu ku gelê me ji dagirkirênu ku jiyan di Kurdistanê de veguherandine dojehê re, xwînerên me yên hêja! Em we silav dikin û em bi hejmareke nû kovara we ya bi navê "Ciwanê Şoreşger" derdixînin.

Komploya navnetewî ya cînayetî ku di sala 1998an de Rêber Apo hedef girt mijara sereke ya hejmara kovara we ye, her wiha di nava xwe de perspektivê Tevgera Ciwanê Şoreşger yên li ser şehîd Vejîn Jiyan û jînameya şehîdê şoreşger Bawer Agir dihewîne. Her wiha girîngiya parastina rewa û gelek mijarêng girîng têde hene. Em di wê baweriyê de ne ku me ji we re mijarêng ku xizmeta tekoşîna we ji bo azadiyê û rûmetê û ji bo zanebûna we di rizgarkirina welat û têkbirina dagirkirî û çeteyên wê yên xayîn û serî jê re tewandine hilbijartine.

Her wiha em di wê baweriyê de ne ku wê ciwanêng welatparêz yên zana, şoreşger, demokrat û rîexistinkirî bi rihê şehîdên pêngava "Hûn nikarin roja me tarî bikin" û li pey şopa şehîd Bawer Agir û Vejîn Jiyan de bi vîna berxwedana Zap, Avaşîn, Metînayê û bi hêrsa serhildanêng birayêng me li Siwêdayê derba binkeftina herî mezîn li dijminêng jiyan û azadiyê yên dagirkir, faşîst û kapitalizmê bixînîn û wê serkeftinêng mezîn diyarı Rêber Apo, gelîn herêmê û mirovahiyê bikin.

Em di wê hêviyê de ne ku hûnê di kar, tekoşîn, meş û armancêng xwe bi ser bikevin. Heya derxistina hejmareke din ji bo we.

RAGIHANDINA CIWANAN

Li hemberî şerê taybet, weke ragihadina şerê gelê şoreşgerî, xebatkarên «Ragihadina Ciwan» bi awayekî dilxwaz û bê navber di têkoşînê de ne.

Bi nêrîn û pêşniyarên xwe, bi şandina berhemên xwe, bi buyina endamê «Ragihadina Ciwan» bibe dengê heqîqetê...

racciwan@gmail.com



ragihadinaciwana

t.me/Rac_ciwan



fb.com/Racpress

RacPress1




ragihadinac



KOMPLOYÊ NAVDEWLETÎ

Û RASTÎYA PERGALÊ



RÊBER APO



i sala 1998'an de ji ber van faktorên dijber ên gihiştin hevdu, ez ji Sûrî derketim. Divê ez eşkere bibêjim; ez jî li xwe hayil bûbûm ku derketina min a ji Sûrî hewce dikir. Ez demeke zêde dirêj li wir mam. Lê belê balkêsiya pêşketina xeta polîtik a ji bo Kurdistanê û helwesta min a dostaniyê ku min dixwest bigihînim asteke stratejîk, hema bêje min kiribûn êsîrê xwe. Rêveberiya Sûrî di asta herî jor de fikarên xwe yên ji ber vê yekê bi taybetî destnîşan kiribûn. Divê ez di vî warî de li xwe mikur bêm. Lê ez hînê jî li girîngiya dostaniya gelan di asta stratejîk de xwedî derdikevim û dibêjim; dev jê nayê berdan. Heman têgihiştinê ez birim Yewnanistanê. Bi dewleta Yewnan re nebûya jî di asta duyemîn de danîna dostaniyeke qedirbilind bi gelê Yewnan re bala min dikişand. Bi çanda wan a klasîk û dîroka wan a trajîk re danûstendin gelekî girîng bû. Jixwe erka dostaniyê ev yek li ser mirovî ferz dikir.

Rêyeke din a ku min karîbû pêde biçûma çiyayê Kurdistanê bûn. Dema ez zarok bûm navê, 'Dînê Çolê, dînê Çiyê' jî li min kiribûn. Lê ji ber du sedeman min ev plan weke alternatifâ duyemîn dihişt. Li çiyê, li devera ez bimama wê

bi her cureyê sîlehan bombe bikirana, zirareke mezin wê li heval û gelê me bibûya. Wexta min ji vî awirî li mijarê temaşe dikir, eşkere min didît ku tenê rê û rîbazên eskerî wê bikevin dewrê û bi tevahî reya eskerî wê xwe li ser me ferz bikira. Ya din jî ew bû ku xeşîmî û bêperwerdebûna ciwantiyê bû. Ji sedî sed diviyabû min ew perwerde bikirana. Ji ber baweriya bi van her du pêdiviyan, min xwe ji reya çiyê kir.

Xulase li Tirkîyê gelek derdorêñ fermî û nefermî digotin; ‘Me ew di quncikê de asê kiriye, binêrin me çawa encam girt.’ Îdîayêñ bi vî rengî ji rastiyê dûr bûn. Jixwe heman politîka tengavkirinê gelekî li ser Îran û Iraqê dihat ceribandin. Encamdana van politîkayan bidin aliyekî, berevajî dibûn sedem ku bi çavkorî di nava mijar û çîravê de bist bibin, biçikin.

***Eger ev serhatiya min
nebûya,bihêlin min ev
analîz û tehlîl bikirana,
ez ê yan bûbûma
milletperest û dewlet-
neteweparêzekî çor***



Têkiliyêن taktîkî yên bi Îran û Sûrî re ji niha ve nedîyar in, wê bi xwe re çi encaman bînin. Mirov dikare bibêje politîkayeke welê ye, bi gelek encaman avis e. Kengî dualîteya Dewletêñ Yekbuŷîyêñ Emerîka-Yekîtiya Ewrûpa-Îsraîl an jî Îran-Rûsyâ-Çînê zelal bibe, gelo hukûmetên komarê ji her encamê re amade ne? Dersêñ min ji serhatiya xwe ya sê mehêñ di navbera Atîna-Moskow-Roma de girtine, bêguman dersêñ dîrokî ne. Têgîna modernîteya kapîtalîst ku hîmê parêznameya min e, di nava hezar û yek zirx û maskeyî de nas kir. Bi vê serhatiyê min ev têgîn nas kir. **Eger ev serhatiya min nebûya,bihêlin min ev analîz û tehlîl bikirana, ez ê yan bûbûma milletperest û dewlet-neteweparêzekî çor** an jî weke bi sedan mînakêñ xwe, heta bi yên dewlet jî avakirine, min ê weke tevgereke çepgir a klasîk çarenûsa xwe bi dawî bikira. Weke prensîbeke zanîna civakî ji sedî sed û vebirî napeyivim û vê prensîbê

her li ber çav digirim. Lê hiseke min a xurt heye ku dibêje; tu yê ti carî negihişti-bûya hêza xwe ya analîzê ku tu niha gihiştiyê.

"Ji bo min eşkere ye: modernîteya kapîtalîst hêza xwe ya esas ne ji pereyê xwe digire û ne jî ji sîlehên xwe" - ji fikirê xwe ye

Ji bo min eşkere ye: modernîteya kapîtalîst hêza xwe ya esas ne ji pereyê xwe digire û ne jî ji sîlehên xwe; utopya sosyalîst a herî dawî û herî bi hêz jî di navê de, bi tevahî utopyayan bi rengan dixemilîne û ji sihêrbazê herî zîrek jêhatîtir hemûyan di nava lîberalîzma xwe de difetisîne û ev yek hêza wê ya esasî ye. Heta baş neyê analîzkirin û jihevderxistin, ka çawa utopya hemû di nava lîberalîzma xwe de xeniqandine, bihêlin li ber rabûna kapîtalîzmê, ekola fîkrê ya herî ji xwe razî jî wê jê neyê nebe xizmetkarê wê. Kesî bi qasî Marks kapîtal analîz nekiriye, kêm kes bi qasî Lenîn li ser dewlet û şoreşê ponijî ne. Lê iro eşkere bûye ku herçend xwe weke dijberê wê nişan dabin jî rêuresma Marksîst-Lenînist mane û materyalekî têra xwe diyarî kapîtalîzmê kiriye. Ji ber ku li ser bendewariyên îradeyên me yên ji koma têgihiştinên cihê yên dîrokî pêk têن, weke ku gelek caran hatiye dîtin, encam dane. Ez vê yekê weke têkili-yeke diyalektîk û çarenûsa ku mirov neçarî wê ye, destnîşan nakim. Berevajî, encama ez digihîjimê ew e ku mirov divê bêhtir serê xwe bi utopyayê azadiyê re biêşîne. Eger civak û ferdê Lîberalîzmê ji rê derxistiye neyên analîzkirin û



mirov wan nexîne mecraya wan a insanî, encam wê ji kansêra civakî wêdetir tiştekî din nebe. Ez ê vê yekê dûrûdirêj bînim ziman.

Ez dixwazim gotinê bînim vir: nûnera Konseya Ewrûpayê ya li Gîrteha Îmralîyiê xêrhatina min kir, heta ez sîstema sêhrî ya li pişt vê xanimoka heftê salî yanî modernîteya kapitalîst ji hev dernexînim, diyar e, ez ê çarenûsa xwe jî ji hev dernexînim. **Pêvajo ji serî heta binî ji aliyê Îsraîl-DYE-YE û Rûsyâ Sowyetê ya ji hevketî hatiye afirandin. Rola hukûmetên Sûrî, Yewnanistan û Tirkîyê jî ji xizmetên burokratîk ên destên duyemîn zêdetir tiştekî din nîne.** Di pêvajoya jêpirsînê de min ji rayedarêن Tirk – yên çar saziyên bingehîn; nûnerê Îstîxbarata Fermandariya Giştî, Teşkîlata Îstîxbarata Millî, Mudîriyeta Giştî ya Polîsan û Îstîxbarata Jenderme – re got; ti maneya wê nîne hûn bi girtina min kêfxweş dîbin. Bi awayekî rezîl û bêbextiyeke Bedewiyêن li çolan jî li xisletên xwe yên mirovane daneynin, bi têkiliyeke dostaniyê û bi komployeke nedîtî, ez avêtîm balafirê û piçikîn ser min, ev yek di ti şêwazê şer ê egîdiyê de tine. Ev rastî bi xwe jî mînakeke baş e, û eşkere nîşan dide ku modernîteya kapitalîst a Dewletêن Yekbuîyêن Emerîka hegomonê wê ye, xwedî lîberalîzmeke çawa ye. Sîstema di zordestî û îstîsmarê de sînornenas.

*Pêvajo ji serî heta
binî ji aliyê Îsraîl-DYE-
YE û Rûsyâ Sowyetê
ya ji hevketî hatiye
afirandin.*




LI HEMBERİ ÇANDA KAPITALİZMÊ ÇANDA XWE RIPARÈZE

CENGA
AZADIYÊ
SERBIXIN



PERSPEKTİFA KOVARA CIWANÊN ŞOREŞGER



PERSPEKTİF



erxwedana kû Rêber APO di zindana Îmralî de dide meşandin bû ye çavkanîya hêvî û ilhamê ji bo hemû kesên azadixwaz re. Dewleta tirk ya faşist û qirker dixwaze tevgera azadî û gelê Kurd tasfiye bike. Bi politika şerê taybet û psikolojik zexteke bê navber li ser Rêberti didin meşandin. Di şexse Rêbertî de dixwazin gele Kurd qır bike û tevgera azadî tasfiye bikin. Dewleta tirk li hemberî berxwedana gerîlla xitimîye û tengav bûye. Gerilayêñ azadiya Kurdistanê berxwedaneke bê hempa didin meşandin. Îradeyeke ji pola û bi vîna APOyî li dijmin dixin û şer dikin. Ev sê salin dewleta tirk hewl dide bikeve alanê Parastina Medya û dagir bike. Ji bo vê bike hemû derfetên NATO û hêzên komploter bikar tîne. Lê heya niha nikariye encam bigre. Ev sê sale li Zap, Avaşin û Metîna şereke bê eman tê meşandin. Hemû cûre silah tê bikaranin û heta yên kîmiyawî û termûbarik jî hatin şûxûlandin. Tu dikare bêje çiyayêñ Kurdistane kirin qadêñ ji bo silahên xwe ceribandine. Ev li ber çavê hemû dûnyayê ye hat şûxlandin, bê ku kes dengê xwe bike. Niha jî em dibînin li Girê Cûdî û Tepê FM (yani li Rojavayê Zapê) şer bi dijwarî berdewame. Rûxmê ku şert û mercên havînî ye, lê hev-

alên me çalakîyên pir bi bandor lidar dixin û derbêñ mirinê li dijmin didin. Ev rih rastiya PKK'ê temsil dike, rastîya Rêber APO temsîl dike û ev rastiya ciwanêñ APOyî dide dîyar kirin. Bi hezaran ciwan di nava refêñ PKK'ê de cîh digrin û her yek ji wan xwedî biryar û iddaya kû dijmin li ser xaka Kurdistanê bavêje. Bi cesaret û bawerî bi doza xwe ve girêdayî ne û amade ne ji bo welat her tişt bike, ji bo vê welat li ser her tiştî ye. Ji bo wê em dibînin ciwanêñ APOyî xwe pêşniyare cihêñ zor û zehmet dikin. Westandin, nikarim û ez nizanim li cem wan nîne. Lêgerîn, meroq, hezkirin, ked û rêhevaltî di çavêñ wan de dibiriqe. Êdi bi van taybetmendîyan têñ naskirin. Ev rastîya gerilayêñ azadîya Kurdistanê ye.

Li cem ciwanêñ APOyî westandin, nikarim û ez nizanim nîne. Lêgerîn, meroq, hezkirin, ked û rêhevaltî di çavêñ wan de dibiriqe.

Rêhevalên hêja, salvegera 39'min ya cejna Vejîne me li pişt xwe hişt, bi rihê pengava cejna Vejîne, pewîste em li ser dijmin de biçin, xwe reexistin bikin, perwerde bikin û çalak bibin. Bi germahîya kû me ji meha Tebaxe girt, pewiste em biçin li ser kar û xebatê xwe û erkên demê pêk binin. Di van mehêñ pêşîya me salvegera komploya navnetewîyê tê. Hêzên komploter zextêñ cidî li ser dewleta Sûrî çekirin û tehdîd kirin eger Rêbertî ji welatê xwe dernexin wê erişi Sûrî bikin. Rêber APO 20' salan li Sûrî kar kir û Rêberti qebul nekir ku zerar bigihe Sûrî. Li ser vê esasê di 9'ê Cotmehê de Rêber APO ji Sûrî derket û berê xwe da welatên Ewrupa û Rûsyâ. Li ser esasê kû hinek welatan soz daye ku Rêberti wekî penaberê siyasî bigrin gel xwe û lê xwedî derkevin. Lê sozê xwe pêk ne anîn



û Rêberti radestî NATO kirin û wan jî ji mile xwe de teslîmî Tirkî kirin. Ji bo vê Rêberti behsê dike û dibêje; ya kû bû sebep komplot pêk were rêhevaltiya kêm û dostonîya sexte bû. Ev rastiyê pewist e tu caran ji bira me neçe. Wekî ciwan ev her li ber çave me be û li hemberî wê em her di nava têkoşîne de bin. Rastiya hêzên komploter pewiste em baş nas bikin. Yê ku dijminatiya gelê Kurd dikin, belkî îro li Rojavayê Kurdistanê jî hene, ema gerek e em vê bizanin, ev tekiliyê demkî ne û ne stratejik in. Ev hêz dijminê me ye, yê ku dihêlin komplot berde-wam bike û tecrîd kûr bibe ev hêz e. Wekî Tevgera Ciwanêن Şoreşger erkê me ew e kû em vê rastiyê baş nas bikin û bidin naskirin. Helwesta ciwanêن APOyî yên Sûri li hemberî wan derxin zanebûne û têkoşîneke radikal pêş bixin. Heya ku em Rêber APO nav xwe de nebînin û şert û mercen Îmralî negûherin, em jiyan-neke normal û rehet ji bo xwe qebul nakin û dijmin bernadin. Bi rihê hevalên kû îro li çeperan şer dikin, emê jî li hemû qadêni jiyana xwe de rêxistin bikin û qadê



ji dijmin re teng bikin. Ev pêva-joya havîne pêwîste em baş binixînin, heyâ ji destê me tê xebatê per-werde (qamp, gûrupêñ lehirbûne, perwerde girtî û vekirî... hwd) pêş bixin. Ji ber bi vî rengi em dikarin gûhertinêñ mezin di kesayete de çêkin û ev bibe bingeha ku şoreşa zihni û çandî li Rojava pêşbikeve. Bê zanebûn ev ne mûmkûn e. Pêwîste em giranî bidin naskirina paradîgmayê Rêbertî, ji ber di vir de kemasîyêñ cidî tên jiyan kirin û her kes gorî xwe paradîgma dide naskirin û pêktîne. Ev bi serê xwe pirsgirêk e. Rêber APO dibêje; "kesê ku ji min hezdike û ji min re rêz digre, min pêktîne." Ji bo wê em Rêbertî dûbare

nekin û teqlid jî nekin. Rêber APO çi dibêje em wê bikin, ji jiyana xwe û ji malbata xwe de despêbikin. Gûhertin û vegûhertinên bingehîn çêbikin. Wekî Tevgera Ciwanên APOyî li hemberî komplo têkoşîn kirin wezîfeke me ya sereke ye. Li ser esasê xwe gihadina hemû ciwanan û ji bo yek ciwan bê rexistin nemîne û hemû ciwanan di nava pergala Rêbertî de cih kirin weki karê xwe ye sereke dizanin. Perspektîfa demê ji bo me ev e, hemû kar û xebatê xwe bi rihê seferberiyê ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber APO bidin meşandin. Bi şıara "CENGA AZADÎYÊ SERBIXIN" hemû kar û xebatê xwe em bidin meşandin. Xwe ji bo şer amade bikin û hazirtîya rizgarkirina alanên dagirkirî em bikin. Li Efrîn, Girê Spî û Serekaniyê dewleta tirk rojane dest davêje gel û axa me û her tiştî li ser wan dide ferz kirin. Qadêن dagirkirî li benda me ne, rojane rastî destdirejî, tecîz, tecawûz û kuştinê têن. Bi perspektîfa şerê gelê şoreşgerî jiyana xwe rexistin kirin û bi rêvebirin em dikarin dagirkerîye li ser axa

xwe bi dawî bikin û Kurdistana azad misoger bikin. Bi hemleya "Mala xwe, taxa xwe, welatê xwe biparêze" em xwe bigihînin hemû gûnd, navçe, kolan û bajaran ciwanan dawetî xwedî derketina welat dikan.

Sibê dereng e, dem ev dem e werin em bi hevre mala xwe, taxa xwe û welate xwe biparêzin. Ji hemû cûre dest aveştine, ji madeyên huşbir, fu-huş û ji ajanan (sîxur) paqij bikin û ciwanan ji xefka dijmin xilas bikin. Heya kû hişiyarbûnek ava nebe, qirkirina çandî bi dawî nabe.

Heval Vejîn kedeke mezin di nava xebatê me yê ciwanan daye û ji bo me wê her bibe çavkanîya moral û manewîyat.

Di dawî de di şexsê hevala Vejîn de hemû şehîden şoreşê bibir tînin û soza tolhildana wan didin. Hevala Vejin xwedî kesayetekî şoreşger û wêrek bû. Kedeke mezin di nava xebatê me yê ciwanan daye û ji bo me wê her bibe çavkanîya moral û manewîyat. Tola wan rakirin wê bibe erkê me yê demê. Pewîste em cihê van hevalan vala nehêlin û çeka wan rakin. Xeyalê wan pêkanîn û erkêن wan berdewam kirin dikeve li ser milê me.

Em di wê bawerîyê de ne ciwanek rexistinkirî û hişyar dikare welatê xwe biparêze, li Rêbertiya xwe xwedî derkeve û tola hevalên şehîd rakin. Heman demê de ciwanên APOyî dikarin pêşengtiyeke rast ji bo giştî ciwanên Sûriyê bikin û berê xwe bidin jiyana rast û ya bi wate (yani şoreşgertî) û li hemberî dijmin serî rakin.



JI BO BÎRANÎNA ŞEHÎD VEJÎN JÎYAN



NÛJIYAN OCALAN



izîr, Cizîra Botan. Mala qedîm a vejîn û berxwedanê ye. Dilê dêrîn a Botanê ku her dem ber bi azadiyê ve lêdixe. Bajarê pîroz ku xwedawend afirandin. Bajarê evîna destana Zînê û paytexta şehîd û şehîdan ku gelek leheng afirandin. Di dîroka mirovahiyê de hin tişt hene ku carinan qed-erê diguherînin û dibin sedema destpêkên nû. Carinan ev bûyerek, carinan lehengek, carinan bajarek, carinan çîrûskek e. Cizîr yekane bajarê serhildanan e ku van hemûyan dihewîne. Li cihê ku dijmin goti-

ye "me hêviyên wan kuşt" bajarê neşikestî ye ku hêviyên xwe ji hembêza xwe belav dike û li seranserê Kurdistanê belav dike. Cizîra pîroz bajarê rûmetê ye, ku zarokên xwe ji dilê xwe şandiye çiyayê azad ku lehengiya layiqî dîroka xwe bike.

Heval Vejîn Jîyan di sala 2000'an de, salek piştî komploya navnetewî di nava malbateke welatparêz de weke zarokekî vî bajarê birûmet hat dinê. Hem bi çanda welatparêziya taxa Cûdî ya ku lê ji dayik bûye û hem jî bi tevlîbûn û şehadeta malbata xwe di temenekî biçûk de partiyê nas kir. Di sala 2015'an de dewleta Tirk a faşîst li dijî herêmên parastinê yên Bakur û bi giştî Heremên

Parastina Medyayê dest bi êrişike berfireh dike. Li hemberî van êrişan ciwan-ên Kurdistanê helwesteke dîrokî nîşan dan, li gelek bajaran xendek kolandin û bûn çeperên berxwedanê. Cizîra Botan, bajarê serhildanan jî yek ji wan ci-hêñ ku mînakeke bi heybet a berxwedana parastina gel nîşan dide. Nehîstîn dijmin bikeve hundir û şer lê dijwar bû. Helwestên Mehmet Tûnç ên li hemberî êrîşen qirkirinê yên dijmin gelekî zelal in. Wê ti carî teslîm nebin, heta nefesa xwe ya dawî li dijî faşîzmê li ber xwe bidin. Destana berxwedanê bi pêşengiya bi dehan ciwan û jinêñ ciwan tê nivîsandin. Heval Vejîn yek ji şahidêñ herî nêz ên vê destanê ye. APOGER'ekî şahidê bingehîn ê îrade û berxwedanê ye. Ev hemû taybetmendi-yêñ ku wî dîtiye rêça wî diyar dike. Ew ê bi tenê li tiştên ku dibîne têr nebe, ew zanebûna xwe ve berpirsiyartiyêñ mezin hilgire li ser milê xwe. Ne pê-kan e ku em vê jiyana şas a ku per-galê daniye pêşîya me rast bijîn. Ji bo vê jî ji bilî bûyîna Zîlan, Bêrîtan û Viyan li ser şopa xwedawendant ti rê nemaye. Û ew jî bi hemû dilpakî û bê dudilî vê rîyê hildibijêre.

**Ji ber helwesta xwe ya
îdeolojîk a bê tawîz ji aliyê
rêhevalên xwe û qadêñ ku
lê dixebeitî pir tê hezkirin û di
demeke kin de bi helwesta
xwe ya fedayî derdikeve pêş**

Piştî ku Heval Vejîn tevlî dibe, di nava Komalên Ciwan de beşdarî xebatêñ ciwan-an dibe. Di demeke kin de xwe perwerde dike û dibe milîtanekî APOGER'î. Bi tay-betî li Şengal û Rojava di gelek waran de xebatêñ giring dike. Piştre di nava refêñ YPJ'ê de têkoşîna xwe didomîne. Ji ber



helwesta xwe ya îdeolojîk a bê tawîz ji aliyê rêhevalên xwe û qadênu ku lê dixebitî pir tê hezkirin û di demeke kin de bi helwesta xwe ya fedayî derdikeve pêş. Rastiya ku di hemû biryarên ku xebata xwe de girtiye de bênavber û zelal bû, ev kûrbûna wî ya di îdeolojiya Rêbertîyê de îfade dike.

Di dîrokê de koletiya yekemîn li ser jinan ve hatiye destpêkirin. Lewma êdî azadiya civakê encax bi azadiya jinê pêkan bû. Ji ber vê yekê Heval Vejîn di dilê xwe de evîna azadiyê bi hişmendiya xwe re kir yek û rêuwiya xwe ya ber bi heqîqetê ve domand. Yek ji taybetmendiyê wî yên herî diyar ew bû ku tiştên ku dizanibû bi xwe re sînordar nedikir. Polîtikayêن qirêj ên dijmin li ser ciwanên Kurdistanê eşkere bû. Dijmin ciwan û jinêni ciwan, bi jiyana yoz û çandek qirêj, ber bi tola tiryak û fuhûşê ve kişand. Bi vê armancê dihat xwestin ku di şexsê ciwanên Kurd de gelê Kurdistanê lewaz û bêhêvî bihêlin. Heval Vejîn bi çeka xwe ya herî xurt, bi hişmendiya xwe ya rêexistinî, li hemberî vê têkoşîneke bêhempa daye. Ciwanên Kurd û Ereb perwerde kir û bi afirandina hişmendiya civakî ew xist in nava têkoşînê.

Heval Vejîn bi fedekarî û dilnizimiya xwe û bi helwesta xwe ya îdeolojîk derdora xwe bandor kir.

Yên ku dixwazin civakê azad bikin divê pêşî xwe azad bikin. Ji bo vê jî ev jina ciwan a ku ji dilê Cizîra Botan derketibû, xwe ji hemû taybetmendiyê koledariyê yên pergalê paqîj kiribû. Ew jineke milîtan a li ser şopa heqîqetê, APOGER bû. Dibe ku li Botan, Dêrsim û Bakur de nekarîbû xeyala xwe ya gerîla pêk bîne, lê ber bi wê ve diçû. Çawa ku 8 sal di jiyana xwe ya têkoşînê de bi têkoşîneke têr û tijî derbas kir, bi şehadeta xwe re jî di navbera Berxwedana 14'ê Tîrmehê û Pêngava 15'ê Tebaxê de bû pirek. Li ser vê yekê em careke din Ş. Vejîn Jiyan bi bîr tînin, em soza xwe ya pêkanîna xeyalên wê yên şoreşgerî dubare dikin.



Ey welat!

Di heyvek tijî de

Min xewnêñ xwe danî ser milê xwe û min xwe spart
bilindahiyan

Mirina ku di zikê te de tov
dide

Jiyanek ne hêjayî
jiyanê

Ew hêrsa ku dabû
li ber devê namluyê
bû.

Di vê valahiya bê aso
de ku zilm serdest e
Ji min re guncav e
ku ez mîna gerîllayekî
bikenim

Li ser axa dilê min a bi
bereket


Min tenê evîna te jiyan kir
Niha di vê şerê mahşerî de
Ev dirûna evînê ye,
jiyana min.





ŞOREŞGERÊ APOYÎ YÊ

PÊŞENG Û MUKEMEL



HARÛN BARAN



Ê zanîn ku berîya bi sed salî li peymanê ku di encama Şerê Cîhanê yê Yekem de, di navbera hêzên xûnmij û metînger de hatin îmzekirin de, biryara di nav lepêna faşîstên li Tirkîyê, Îranê, Îraqê û Sûriyê de, kurdan di qirkirinê re derbas bikin. Lewra tevahî serhildanê kurdan bi destê van dagirkerên faşîst û Birêtanya, Firansa, Emerîka hatin tesfiyekirin. Di encama van şerên qirkirinê de zêdetirî 300000 kurd di tevkijiya re derbaskirin û bi milyonan kurd koçberî tevahî cîhanê hatkirin. Yan ewê kurd li Kurdistanê di komkujiyan re derbasbana, yan wê bibana tirk, ereb û fars û yan jî wê li derveyî welat bibana alman, rûs, firansî, înglîz û her wiha li gor welatê ku koçî kirî. Ev biryara sedsalê ya qirkirina kurdan a bi navê peymana Lozanê bû.

Divîyabû hêzekî mucîzewî ji kurdan re derkeve, divîyabû bi ci awayî dibe bila bibe rê li ber mirina vî gelîbihata girtin, divîyabû êdî têkçûn, bêçaretî û binkeftin ji ferheng, hest, ruh û mêjiyê kurdan derketa, êdî qêrîna dayîk û zarokan li vî welatî bangîniya xwe bidîta. Lewra Rêber Apo piştî demek dirêj ji lêkolîn û lêhûrbûna giran, di destpêka salén 1970 de vê biryara dîrokî a giran û dev jêneger digre. Rêber Apo dibêje hîngî giraniya wê hebû, ez ji ser hişê xwe çûbûm

û heval Heqî rasta min hatibû ez rakiribûm.

Bê guman ger rê li qirkirinê hat girtin, wek mîna ku Rêber Apo di helbesta xwe ya ji bo dewrêşê evdî de dibêje rihet razê êdî kurdîtiya azad rastiya ebediye. Ger ku kurd di cîhanê de bûn hêza ku NATO, Rûsyâ û dewletên dagirker pêre heyrîne çawa teslîmbigrin, ger ku kurd bûn qehremanên ser dika dîrokê ya sed-salê û ger ku tolhildana dîrokî mezin tê hilgirtin û ger ku kurd bûn hêviya xilasiya tevahî mirovahê, ev yek ji ber rêbertiya Rêber Apo ye di serî de. Di heman demê de ev yek encama fedayîtiya keç û xortên apoyî yên qehreman e. Yek ji van hezaran fedayîyan ku di tekoşîna şoreşgerî de pêşengekî bi heybet yê PKK yî bû û bi şehadeta xwe ve ku heta hetayî di asîmanê ciwanan û gelê Kurdistanê de bû stêrka herî ronak ya riya azadî yê û şoreşgeriyê, Bawer Agir e.

Bawer Agir bi navê malbatê Ehmed Akyûz li çinara Amedê ji malbatek kurd ya bi esl û welatparêz jidayîk dibe. Ew jî wek bajarê Amedê hîna ji zaroktiyê ve li ser şopa şêxseîdan û berxwedana zîndana Amedê, serî li dijî koletî, bindestî, bê rûmetê û tevahiya sîstema dagirkeriya li Kurdistanê rakir. Di salê destpêka ciwantiya xwe de êdî di nav xebatêng rizgariya netewî de cih digre, bi taybet jî di nav xebatêng ciwanan de, esaleta kesayetî ya ku ji malbata xwe ya amedî girtî dema ku bi rastiya Rêber Apo û ramanêng wî û kesayeta milîtanê apoyî ku wî afirandî yê re dema dike yek, êdî ew tam dibe melakekî mukmel û milîtanekî apoyî yê pêşeng. Lewra ew di kur re derbasbe bi wê kesayeta xwe nepêkane ku dil û mejîyê mirovan fetih neke, rêxistinê avaneke, rê li ber serî rakirinêng li dijî dagirkerê veneke.

Piştî demek dirêj ji tekoşîna li dijî faşizmê li bakurê Kurdistanê û Tirkîyê, ew di sala 2012 de biryar dide ku li ser riya Mazlûm Dogan, Kemal Pîr û Mehmed Xeyrî Durmûş, êdî wek şoreşgerekî xwe bide doza azadê ya gelê kurd û mirovahiyê û piştî jî berê xwe dide çiyayêng Kurdistanê yên bi heybet, yên ku her azad mane û bûne dergûşa afirandina fedayîyan ji bo Kurdistan. Ji ber ku rêheval Bawer Agir dizanî ku wateya çiyayêng Kurdistan çi ye û bandora wê li ser têkbirina dagirkeriyê çi ye. Piştî bi demekê ku perwerdeyêng idiyolojîk û felsefîk li ser parêznamey-

**Ew jî wek bajarê Amedê
hîna ji zaroktiyê ve li
ser şopa şêxseîdan û
berxwedana zîndana
Amedê, serî li dijî
koletî, bindestî, bê
rûmetê û tevahiya
sîstema dagirkeriya
li Kurdistanê rakir.**



êن serokatî dîtin, gavên gelekî mezin di kesayeta xwe ya şoreşgerî de avêtin, lewra ew bû cihê hêvî û bawerîyêñ mezin û wek endamê qordînasyona gîştî ya komalêñ ciwan hat hilbijartin.

Tevî ku wî zareveya soranî nedizanî di nava demek kurt de bi sedan ciwan rôxistin kir

Dema ku çeteyêñ modernîteya kapîtalîst û hevkarêñ faşîzma tirk, DAIŞ êrîş bir ser kurdan li başûrê Kurdistanê, şehîd Bawer vê carê derbasî kelha welat-parêziyê Kerkûkê bû. **Tevî ku wî zareveya soranî nedizanî jî û ciwan û gelê Kerkûkê jî kurmancî nedizanîn, lê şehîd Bawer Agir bi wê kesayeta xwe ya milîtan û şoreşgerî ku bê quşûr bû, tam kesayetiya PKK jiyan dikir û temsîl dikir, di nava demek kurt de bi sedan ciwan rôxistin kir**, gelek ji wan bi bandoriya sekna wî ya bi heybet, durust, kedkar, cesûr û dilsozê welat bandor bûn û tevlî nava refêñ gerîla bûn, ji ber ew ji xwe re esas girtin di nav refêñ gerîla de gavên serkeftî avêtin, di heman demê de gelek ciwan bi pêşengtiya şehîd Bawer ji Kerkûkê tevlî nav berxwedana rojavayê Kurdistanê jî bûn û bi ciwanêñ ku li Kerkûkê rôxistin kirî dikarî seknek bi cesaret ya gelê Kerkûkê û ciwanêñ wê mil bi milê gerîlayêñ azadê ku çeteyêñ daîşê li Kerkûkê têkbirin pêşbixîne. Bi vî awayî xebatêñ ku şehîd Bawer meşandiye her serkeftibûna xwe îsbatkirê ye.

Herî dawîyê vesaziya şehîd Bawer li xebatêñ ciwanan ên rojavayê Kurdistanê di nav rêvebirya gîştî de çêbû û bi taybet jî li herêma Kobanê û Girê Spî bi cih bû, ji ber ku wê demê hesabêñ gelek aliyan yên xeter li ser Kobanê hebûn, di serî de jî dagirkeriya tirk a faşîst. Li wê der li ser ciwanan û civakê pilanêñ giran yên şerîn taybet bi rêve diçûn, bi vî awayî, şehîd Bawer ji ber baweriya partiyê bi kesayeta xwe ew vesazî wir kiribû.

Li Kobanê û Girê Spî ne tenê li ser xebata ciwanan, lê belê ser tevahî civakê bi wê kesayeta xwe ya ku di her warî de sekna mukemel û pêşeng a şoreşgerê apoyî temsîl dikir, bandoreke gelekî mezin çêkiribû.



Di dema ku komploya hevbeş a Emerîka, NATO û dagirkeriya tirk li dijî şoreşa rojava, ku di roja komploya navneteweyî ya li dijî Rêber Apo de, kete pratîkê li Serêkanîyê û Girê Spî, rêheval Bawer Agir digot, ev pilanek gelekî xetere ger ku dijmin li Girê Spî neyê şikandin û têkbirin wê derbasî her deverê bibe. Ji ber wê jî bi îsrar got ez ne li Kobanê lê li Girê Spî li cebha herî pêş û xeter dixwazim bi cih bibim, digot çenabe dijmin derbasî Girê Spî bibe.

Bi vî awayî bi nêzî 35 ciwanan kurd û ereb re li ber deriyê sînorê Girê Spî di xeta herî pêş de hema di heman şeva êrîşa yekemîn de, bi insiyatîva xwe xetek cebhê avakir, tevî ku îmkanên di dest de kembûn.

Roja berya şehadeta wî me hev dîtibû, dagirtî moral bû, wek navê xwe heta dawiyê bi xwe bawerbû, bi hêrsek gelekî mezin jî li benda hatina dagirkeriya tirk û çeteyêne wê bû. Lê dijmin di gundan re êrîş dikir û Girê Spî çember dikir. Di roja çaremîn a êrîşê de, ango di 13 Cotmehê 2019 de, emrê vekşînê hatibû tevî ku rast nedidît jî lê ji ber ku li ser navê rêvebiriya rojava bû wî iltîzamkir û bi hevalên xwe re vedikşîya, balefir bi rêve li wan didin, ew û şehîd canfeda hevalên din û sîlehan li navbera Girê sipî û Eyn Îsa li seyareyan siwar dikan û dışîni bi xwe jî li pey dimeşin û di vê esnayê de balafir li wan didin.

Şehîd Bawer Agir ango şoreşgerê pêşeng û mukmel, bi vî awayî ne bi destê dijminê tirsonek lê bi teknîka nûjen a NATOya xûnmij hate şehîdxistin. Bi vî awayî ne tenê tevgera ciwanên apoyî lê PKK yek ji pêşengên xwe yê siberojê fedakir, ji xwe şehîd Bawer wiha pêşengek bû ku dizanî kengî li ku ci zerorî ye û ji milîtanê apoyî tê xwestin, wisa heta nefesa xwe ya dawê li dijî dagirkerê û hêzên komploya navdewletî, bi hesreta dîtina Rêber Apo û Kurdistan azad xwe fedâ kir û bû ronahîya rêya hevalên xwe, ciwanan û mirovahiyê.

Şehîd Bawer Agir Stêrka Ciwanan





JI PÊXEMBERAN HEYANÎ RÊBER APO Û RÊWÎTİYA 9'Ê COTMEHÊ



DELÎL DOXAN
ROJNAMEVAN



irovahî di dîroka xwe de di pir qonaxan re derbas bûye, her qonaxeke jî xwedî pêşketin û taybetmendîyên cihereng e. Heyanî ku mirovê îro ev teşeyê xwe girtiye, bi gelek bûyerên ji hev cuda re rû bu rû maye. Em dikarin dîroka mirovahîye wekî zincîra bûyer û pêşketinan bibînin ku tevahîya xelekên wê hev temam dikan. Lewre jî şîrovekirina bûyereke niha divê bi pêşketinê ku duh çêbûne re, were livandin da ku em encameke

tekûz bi dest dixin.

Piştî pêşketina hişmendîya desthilatdarîyê di nava civaka mirovî de, mirovahî derbas qonaxeke pir zehmet bû û li kêleka xeta civakê, xeta xirabî û zordestîyê her ku çûye, şerê xwe dijwartir kiriye. An ku em dikarin bêjin ku êdî di civaka mirovan de du xet hene; xeta civakê û xeta desthilatdarîyê.. her du jî di nava xwe de şerekî dikan; ku her cara xeta desthilatdarîyê şerê xwe gur kiriye, xeta civakê jî asta berxwedanê bilinditir kiriye. Ev şerê navborî bi pêşketina hişmendîya sermayedaîyê (Kapîtalîzm) re gihiştiye lutkeya xwe ya herî tirsnak.

Berxwedana civakê ya li beramber şerê desthilatdarîyê, di seranserî dîrokê



de, bi pêşgentîya kesên ne ji rêzê bi pêş ketiye. Ev berxwedanî li jêr gelek nav û nasnameyêن cihê de hatiye meşandin; carinan bi navê êlan, carinan bi navê fermandaran û carinan jî bi navê pêxember û olê jî pêşengtî berxwedanî daye meşandin.

Berxwedana pêxemberan jî, di wateya xwe ya giştî de berxwedana li dijî sîstema desthilatdar a li dijî vîn û nasnameya civakê ye

